Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 49
15'ê Oktober
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne


## Sekreterê Giştî Yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî Yê Nû Hate Hilbijartin



Roja înê, 13.10.2006'an,"Ban Ki Moon", Wezîrê Karê Derve yê Kureya Başûr bi awayekî fermî wekî Sekreterê Giştî yê vê rêxistinê hate hilbijartin...

**Rûpela 3**

**Di civîna Parlemana Ewropayê de li ser çanda Kurdan hate gotin:**

# Kurd Mezintirîn Neteweya Bê Dewlet



Kombûna Parlementarî ya Encûmena Ewropayê di civîneke xwe ya çend rojên borî de biryara resolutsyonekê da ku tê de banga piştgirtinê ji bo parastina çanda kurdî dike. Kombûnê ji Turkiyê re ku endameke Encûmena Ewropayê ye, pêşniyar kir ku li ser derfeta perwerdeya bi zimanê kurdî li deverên ku ew wekî zimanê zikmakî tê bikaranîn, li kêleka zimanê fermî birame. Wê(kombûnê) her wiha pêşniyar kir ku Turkiye kursên ziman û wêjeya kurdî li zanîngehan pêşniyar bike û piştgirtina deugehên kurdî yên çandî bike. Kombûna Parlementarî her wiha ji hikûmetên Îran, Îraq û Sûriyê doz kir ku "bizanin ku ziman û çanda kurdî beşek e ji mîratê(mayîna) welatên wan bi xwe ku ew dewlemendiyeke mayî ye û ne gefek e ku şerê wê bihê kirin".

**Deqa biryara 1519'ê ya kombûna Parlementerî bi zimanê Kurdî di rûpela 2**

## Yekîtiya Ewropayê Dixwaze Rabigehîne Ku Gotûbêjên Bi Îranê Re Rastî Têkçûnê Hatine

Di halekên de ku welatên 5+1 di halê girtina biryarê li ser çawaniya dorpêçkirina Îranê de ne, roja înê, 13.10.2006'an, dîplomatekî Ewropayî ku hez nekir navê wî bihê eşkerekirin, da eyankirin ku Yekîtiya Ewropayê dixwaze roja sêşemî 17.10.2006'an, ragehîne ku gotûbêjên derheq bernameyên Etomî yên Îranê bi fermî rastî têkçûnê hatine.

Biryara nû ya Yekîtiya Ewropayê seba serneketina gotûbêjên han di halekê de tê girtin ku gotûbêjên bi dirêjiya çar mehan di navbera nûnerê YE'ê tevî nûnerê Komara Îslamî de tu encamek nebû.

Mercên sereke yên van 6 welatan, ragirtina bernameyên dewlemendkirina Uraniyûmê ji aliyê Îranê bû, lê rejîma Îranê vê gelalê napejirîne.

**Çavkanî: "Radio Farda"**

## TISHK TV Dest Bi Weşana Xwe Ya Asayî kir

TISHK

Roja 10.10. 2006'an, TÎŞK TV dest bi weşana xwe ya asayî (normal) kir. TÎŞK TV ku, roja 24.5.2006 dest bi weşana xwe ya ezmûnî (test)ê kiribû, weşana xwe ya asayî dest pê kir.
TÎŞK TV bi armanca pêşxistina çand û medyaya kurdî hatiye sazkirin û hewel dide ku di vî warî de nûçe û zanyaryên rast û dirust biweşîne.

## Hêzên Amerîka Heya Sala 2010'an Li Îraqê Dimînin



General Pîter Şomîker, Serokê Desteya Erkan ya Arteşa Amerîkayê diyar kir, hêzên Amerîka heya sala 2010'an, di Îraqê de dimînin û dubare kir, hejmara wan hêzane nahên kêmkirin. General Pîter Şomîker di konferanseke çapemeniyê de îtiraf bi metirsiyên şerê Îraqê kir û got ku Amerîka di wî welatî de rastî têkçûna leşkerî nabe. Daxuyaniya Şomîker hevdem e tevî gotinên General Can Ebî Zeyd, Fermandeyê Navendî yê hêzên Amerîka ku tê de gotibû bi sedema zêdebûna dijwariyên olî li bajarê Bexdayê û parêzgeha Enbarê, hetanî bihara sala 2007'an, Wezareta Parastina Amerîka hejmara hêzên xwe li Îraqê kêm nake.

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê nêzîkî 5 tîpên leşkerî li Îraqê hene ku hejmara wan digihîje nêzîkî 145 hezar leşkeran.

**Çavkanî: "Radio Nawa"**


### Daxwaza Neteweya Azerî Bo Bi Fermî Nasîna Xwandin Bi Zimanê Zikmakî



R. 3

### Lubnan Ber Bi Kuderê Ve Diçe?



R. 4

### Xozistan Herêmeke Ku Her Cure Aloziyek Têde, Dibe Sedema Teqîna Na Tebahiyan




R. 5

### Carnameya Pêşgîrî Ji Tund Û Tûjiyê Li Dijî Jinan



R. 7

### Ceferqulî Zengene, Helbestvanê Kurdistana Xerîb



R. 9

### REWŞENBÎRÊN ROJANE



R. 10

# Deqa Biryara 1519'ê Ya Kombûna Parlementarî Bi Zimanê Kurdî

**Rewşa Kurdan a çandî**
Biryara 1519 (2006)
1. Wekî berdewamiya raporên wê yên li ser Qereçiyên li Ewropayê (1993), çanda Cihûyan (1996), Aromanî (1997), çanda kêmaniya uralî ya di bin gefa linavçûnê de (1998) û li ser çanda kêmaniya "Csango" li Romanyayê (2001), Kombûna Parlamentarî dixwaze balê bikişîne ser çand û rewşa Kurdan.

2. Kombûna Parlamentarî berî niha di raporên xwe yên derheq erkên Turkiyê de xwe mijûlî mijarên din yên li ser Kurdan kiriye (**Doc. 9120** a sala 2001ê û **Doc. 10111** a 2004ê) û her wiha derheq rewşa mirovan a gelê kurd ê koçber li Turkiyê (**Doc. 9391** a sala 2002'ê).

3. Pirsa ku Kurd bi rastî ji kuderê hatine? dimîne pirseke neçareserkirî. Ji bo vê biryarê, Kurd grûpeke etnîkî ye ku zimanê wê yê zikmakî kurdî ye. Ew bi taybetî ji sîstemên çiyayên Zagros û Toros tên, wan herêmên çiyayî, ku Turkiye, Îran û Îraq tê de digihîjin hev.
4. Ne hejmara Kurdan naskirî ye, ne jî welatên ku ew bi piranî lê dijîn (Îran, Îraq, Sûriye û Turkiye) di serhejmariya welatiyên xwe de basa nasnameyên neteweyî ya Kurdan dikin. Tê texmînkirin ku Kurd di navbera 25 heta 30 milyonî de ne, ku wan dike yek ji mezintirîn neteweyên bê dewlet.
5. Kurd bi kurdî diaxivin ku zimaneke ji beşa Bakûrê Rojava ya beşa Îranî ya malbata zimanan a Hind-Ewropî ye. Ew bi temamî ji Erebiya samî û Turkiya altaîc cuda ye. Kurdiya nûjen ji çend grûpên bingehîn pêk tê, ya herî mezin grûpa kurmancî ye. Hejmarek ji devokan wan grûpan dikemilînin.

6. Rewşa Kurdan li gorî rewşa welatên ku ew lê dijîn, ji hev cuda ye. Li Îraqê dora 5 milyon Kurd ji dema şerê 1991'an ve, serbixwe ne. Li Îranê ji bilî mafên çandî tu mafên Kurdan ên din tune ne: mafê muzîk û folklorê heye, lê yê perwerdeyê tune. Li Sûriyê yekcarî mafên wan tune ye û heta muzîka wan jî qedexe ye.

7. Dewleta Turk bi dehan salan Kurd qebûl nedikir. Di sala 2004'an de rewş bi weşana bi devokên kurdî di televîzyona Turkî ya neteweyî de û her wiha pejirandina kursên fêrbûna zimanê kurdî hate guhertin. Pirtûk, kasêt û konsertên kurdî hema qedexe ne. Du kanalên televîzyonê yên herêmî yên Prîvat û dezgeheke radyoyê cara pêşîn di 23'ê Adara 2006'an, de dest bi weşanên kurt kirin.
8. Hin Kurd bi pirsa "kuştina namûsê" ve hatin girêdan, lê ev kiryarên hovane ne tenê li cem Kurdan peyda dibin. Ew li deverên paşdemayî (gundan) li Rojhilata Navîn pêk tên.
Pêşketinên di warên perwerde û aborî de dibin sedemên kêmbûna kiryarên wilo. Rêxistinên jinan li Îraq û Turkiyê rolên girîng dilîzin. Qanûna tawanê ya Turkiyê ya nû rê nade pêşiya faktorên ku dihêlin ku cezaya "kuştinên namûsê" sivik bibe û wan wekî kuştinên bi merem bi nav dike.

Kombûna Parlemantarî ya Ewropî derheq doza çanda Kurdî

9. Divêt ku gelek welatî li tevahiya herêmê de adetên xwe bi pêş xînin. Piraniya Kurdan haydar in ku Ewropa tiştek erênî ye û hêviya xwe dixin pêşeroja xwe di Ewropayê de yan jî tevî wê. Ew divêt her wiha haydar bin ku welatê ku "kuştinên namûsê" hîn jî ji aliyê hin kesan ve wekî beşek ji "kevneşopiya" wan tê pejirandin, welatek e ku tu cihê wî li Ewropaya mafê mirovan de tune ye. Kombûna Parlamentarî gavên qanûnî û siyasî ji aliyê hikûmeta Turkiyê ve baş dibîne ku tê hêvîkirin ku ew dê rê li pêşiya guhertinên birêkûpêk ber bi aliyê rast ve veke.

10. Bêtirî yek milyon Kurd li Rojavayê Ewropayê dijîn û li gelek welatên Ewropî ku hejmareke zaf ji Kurdan lê niştecî ne, dezgehên kurdî yên çandî hene. Diasporaya kurdî her wiha roleke siyasî ya mezin di agahdarkirina raya giştî ya Rojavayî de derbarê çarenivîsa Kurdan li welatên cuda ku ew jê hatine, lîstiye.

11. Kombûna Parlamentarî balê dikişîne ser têkstên ku derheq mijarên ku bi vê mijarê ve girêdayî ne, pejirandine, bi taybetî Pêşniyarên 928 (1981) derbarê pirsgirêkên perwerdehî û çandî yên zimanên kêmaniyan û devokên li Ewropayê, Pêşniyarên 1283 (1996) derheq dîrok û fêrbûna ji dîroka li Ewropayê û her wiha Pêşniyarên 1740 (2006) derbarê cihê zimanê zikmakî di perwerdeya dibistanê de.
12. Divêt li pirçand û pirzimaniyê weke kaniyeke zengîn bihê nêrîn ku mîratê me yê Ewropayî zengîn dike û her wiha nasnameya her welat û kesekê xurtir dike. Li ser asta Ewropî û bi taybetî ji aliyê Encûmena Ewropayê ve ji bo parastina vê çanda taybetî piştgirtî hewce ye.

13. Baştirkirina rewşa çandî ya Kurdan yekser girêdayî tekûzbûna siyasî li herêmê ye. Aştî û tekûzbûn girîng in ji bo baştirkirina rewşa çandî ya grûpên etnîk.
14. Kombûna Parlamentarî bangî Turkiyê, weke dewleteke endam di Encûmena Ewropî de, dike ku bi awayekî baş li "Pirsa Kurdî" binihêre û gavên pêwîst bavêje, da ku rewşa çandî ya Kurdan li Turkiyê baştir bibe.
15. Di warê çandî de, Kombûna Parlamentarî pêşniyar dike ku dezgehên Turkî yên xwedî biryar van gavên han bavêje:
**15.1.** Misogerkirina parastina ziman kurdî yê bingehîn bi imzekirin, pejirandin û pêkanîna "European Charter for Regional and Minority languages" (Peymana Ewropî ya Zimanên Herêm û Kêmaniyan) derheq zimanên kurdî ku li Turkiyê tê axavtin.
**15.2.** Ramankirina derfeta perwerdeya bi zimanê zikmakî li kêleka zimanê fermî.
**15.3**. Agehdarkirina dê û bavên kurd li ser derfetên "**linguistic"** ên cuda û her wiha elimandina wan bi çawa ew bikarin doza tiştên heyî bikin.
**15.4.** Pêşniyarkirina kursên ziman û wêjeya kurdî li zanîngehan.
**15.5.** Pejirandin û piştgirtina dezgehên kurdî yên çandî û pêkanîna gotûbêjan tevî wan di warê hevkariya ji bo parastina ziman û çanda kurdî.
**15.6.** Ji nû ve lênihêrîna danûstandinên îdarî ku Kurd di çalakiyên xwe yên çandî de rastî wan tên.
**15.7.** Piştgirtina kurdîaxêvan ku beşdarî derfetên "mass-medya" ya nûjen bibin. Gerek di civata kurdî de ji bo vekirina rê li ber pêşketinên çapemeniya nivîskî, radyo û televîzyonê hebe.
**15.8.** Sazkirina hin navendên din li Turkiyê ji bo piştgirtin ji çanda kurdî, tevî xurtkirina hişyarî û haydariyê û her wiha rêzgirtina kêmaniyan.

16. Kombûna Parlamentarî her wiha ji hikûmetên Îran, Îraq û Sûriyê dixwaze ku bizanin ku ziman û çanda kurdî beşek ji mîratê kevnar yê welatên wan bi xwe ye ku ew dewlemendiyeke mayî ye û ne gefek e ku şerê wê bihê kirin û ji wan dixwaze ku gavên hewce dor vê biryarnameya han bavêjin, bi taybetî di warê zimên de.

Werger ji Îngilîzî: Sîrwan Hecî Berko
**sirwan@amude.com**

Têksta bi ingilîzî dikare li vê derê bête xwendin:
**The cultural situation of the Kurds-Resolution 1519 (2006)**
**Çavkanî: "amude.com"**

# Daxwaza Neteweya Azerî Bo Bi Fermî Nasîna Xwandin Bi Zimanê Zikmakî

**Azad Kurdî**
**azadkurdi@hotmail.com**

Wekî edetên salên derbasbûyî, sala nû ya xwendinê ya îsal jî, wate 2006 – 2007'an, li roja yekem ya demsala payîzê dest pê kir. Lê berevajî hemû salên borî, îsal destpêka sala nû a xwendinê di çend bajarên Azerî akincî yên Îranê de cudahiyeke xuya hebû.

Di çend bajarên Îranê de ku Azerî akincî ne, bi bangewazekê ku ji aliyê komek ji çalakên çandî – siyasî ên Azerbaycanê hatibû belavkirin, bi nîşaneya xuyakirina nerazîbûnê li hember berlêgirtin ji xwendinê bi zimanê dayîkê yê neteweya Azerî û neteweyên din yên Îranê, roja yekem ya sala nû ya xwendina îsal bêhvedan îlan kirin û ji çûn bo dibistan, xwendingeh û zanîngehan xwe parastin.

Xelkê bajarên Tewrêz, Erdebîl, Zencan, Meraxe, Muxan û Urmiyê (ku di vî bajarî de du neteweyên Kurd û Azerî bi hev re dijîn), li vê bangewazê xwedî derketin û ji bo navenda xwendinê neçûn. Xelkê van bajarane di vê rojê de rijiyan ser rê û şeqaman û li dijî siyasetên şovenîstî ên rejîma Komara Îslamî xwenîşandan lidarxistin, hetanî bi vî awayî desthilatdarên hikûmeta Îslamî a Îranê şiyar û agehdar bikin ku çi din nikarin li hember bêedaletî, zordarî, bêhurmetî û binpêkirina maf û azadiyên demokratîk ên xwe bêdeng bimînin.

Di van bajarane de şagird û xwendekarên kur û keç û her wiha xelkê sivîl yê bajar rijiyan ser rê û şeqaman û piştgirî li naverok û kakila wê bangewazê dan xuyakirin û daxwaza bi fermî naskirina mafê xwendin û nivîsînê bi zimanê dayîkê yê xwe kirin. Wekî deb û edetên caran û herdemî yê desthilatdarên dijî gelî û gemar ên Komara Îslamî, hêzên rejîmê û bi taybetî îdareya Ewlekarî û Gorda Dijî Şoreşê bi xurtî êrîşkirin bi ser xwenîşandana aram û mafxwazane ya xelkê. Gelek ji xwenîşander û beşdarên meşa nerazîbûnê girtin û ji cihên nediyar re şandine. Di xwenîşandanên gelî ên bajarên Azerî akincî de, beşdariya çeleng û aktîv ya jin û keçan pir girîng û berbiçav bû.

Rejîma Komara Îslamî heyamê 27 sala ye ku bi domandina rêbaz û polîtîkên çewt û dijî gelî ên Reza Şahê Pehlewî li hember pirsgirêka neteweyî di Îranê de û heya di rejîma berê jî tund û xurtir, mijûlê çewsandin, zilm, zordarî, cudahîdananê ye û asîmîlasyonê dimeşîne. Siyasetên wekhevkirin û helandina kultur, ziman, dîrok û deb û edetên gel û neteweyên pêkîner yên Îranê di çarçoveya **yek netewe û ziman** de bi awayên cur bi cur û sîtematîk û ne serdemiyane dimeşe û meşiyaye.



**Wêne: xwenîşandana nerazîbûnê ya li hember qedexebûna xwandina zimanê zikmakî li Urmiyê – Şeqama Xeyama Başûr**

Encama van siyasetên şovînîstî û ne demokratîk wisa kiriye ku gişt neteweyên Îranê derketine orta xebat û tekoşînê û ji bo bidestveanîna maf û zadiyên xwe û diyarîkirina mafê çarenivîsa xwe xebatê dikin. Helwesta vê dawiyê ya neteweya Azerî, nîşaneya bilindbûna hişyariya seha neteweyî ya neteweyên Îranê ye.

Neteweyên bindest ên Îranê li yek ji mafê xwe yên herî sereke ên çandî û mirovî wekî bi fermî naskirina ziman û nasnameya neteweyan di şeklê neteweyeke xwedî maf û serbixwe de û xwendin û nivîsîn bi zimanê zikmakî yên neteweyan di dibistan, xwendingeh û zanîngehên wan deveran de ku ew tê de dijîn hatine bêparkirin. Ev tirajîdyaya dîrokî bi awayekê birêve çûye ku neteweyên Îranê ji xwendin bi zimanê xwe, hebûna radyo û televîzyonan, pêkanîna navend, rêxistin û civatan ji bo pêşdebirina zimanê neteweyî, kulturî, dîrok û hwd ... hatine bêparkirin.

Her çiqas di benda 15'an ya Qanûna Bingehîn a rejîma Komara Îslamî ya Îranê de, xwendin bi zimanê zikmakî li rex zimanê fermî wate Farsî, di wan herêmane de ku neteweyên din ên Îranê tê de dijîn, bi resmî hatiye nasîn, lê di heyamê 27 sal desthilatdariya kevneperestane û paşverû ya Komara Îslamî ya Îranê de ji bo demekê jî ev bendên yasayê û çend bendên din ên Qanûna Bingehîn ku têkildarê jiyana neteweyên Îranê ye, birêve neçûye. Her kesek bas ji maf û azadiyên neteweyî bike, li gor mentalîteya Komara Îslamî ya Îranê markên "Muxalif", "Murte de", "dijmin", "alîgirî ji biyaniyan" û gelek markên din jê tê lêdayîn.

Siyaset û kiryarên neberpirsane, bê mentalîte û şovînîstî yên desthilatdarên rejîmê wisa kiriye ku îro bi kêfxweşî ve hemû neteweyên Îranê gihîştine vê baweriyê ku heya rejîmeke demokratîk û gelî di Îranê de nehê ser kar û maf û azadiyên berheq yên neteweyên Îranê misoger neke, edalet, demokrasî û azadî cihgir nabe.

Xebat û pêngavên bajarên Azerî akincî yên Îranê di destpêka sala nû ya xwendinê de, bi nîşaneya xuyakirina nerazîbûnê li hember astengkirina xwendin û nivîsandin bi zimanê dayîkê yê xwe, ji ber siyasetên çewt û nemirovane û asîmîlekirinê li dijî neteweyên Îranê hate meşandin. Bê guman eva gava dawîn ya mefxwazane û demokratîk ya neteweyên Îranê nabe û heya hilweşandina rejîma Komara Îslamî ya Îranê û avakirina hikûmeteke demokratîk û Federalî dê her berdewam bibe û heta dê xurtir û mikumtir bibe.

# Siyasetvaneke Kureya Başûr Dibe Sekreterê Giştî Yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî

Roja înê, 13.10.2006'an, di dengdana Civata Giştî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de, "Ban Ki Moon", Wezîrê Karê Derve yê Kureya Başûr bi awayekî fermî wekî Sekreterê Giştî yê vê rêxistinê hate hilbijartin.

Ew dê ji roja yekem ya meha Janviyeya 2007'an bo dema 5 salan weke heştemîn Sekreterê Giştî yê RNY kar û xebata xwe dest pê bike.

"Ban Ki Moon", 62 salî ye û yekemîn welatiyê Kureya Başûr e ku ev berpirsiyariya payebilind li stû digire.

Tê çavnihêrîkirin ku birêz "Ban" di xebat û bizavên têkildar ên çareseriya kirîz û pirsgirêkên navneteweyî de û nemaze li ser nîqaşa bernameyên Etomî yên Kureya Bakûr, roleke girîng bilîze.

Ev dîplomatê biezmûn û jêhatî di sala 2004'an ji bo Wezareta Karê Derve ya Kureya Başûr hate diyarîkirin û di bidestxistina lihevhatinên sala borî yên navbera Kureya Bakûr û beşdarên gotûbêjên şeş alî der barê rawestandina bernameya Etomî ya Piyong Yangê roleke girîng lîst.

Piştî "U Thant", welatiyê Birmeyî ku ji sala 1961 heya sala 1971'an Sekreterê Giştî yê RNY'ê bû, birêz "Ban Ki Moon" duyemîn kesayetiyê siyasî û dîplomatîk e ku vê berpirsiyariyê werdigire.



Kofî Enan pîrozbahî ji cîgirê nû yê xwe kir û pesna wî weke **Mêreke bi mejiyeke bi rastî cîhanî** û **xisletên îstisna û bêmînak** kir.

Birêz "Ban" yek ji wan şeş berbijaran ji bo wergirtina vê posta girîng bû û karî di Konseya Ewlekariyê de her 5 berendamên din neçar bi paşdekişanê bike.

"Ban Ki Moon" roja înê, di axavtinekê de got: "Ji ber vê yekê ku duyemîn Asiyayî ye ku ji bo vê berpirsiyariyê tê hilbijartin, rûmet û serfiraziyê dike û anî ziman ku ew herême ji cîhanê dixwaze ku berpirsiyariyên bêtir di asta cîhanî ji wan re bihê dayîn".

**Jêder: "BBC"**

# Lubnan Ber Bi Kuderê Ve Diçe?

**Reza Fethulanejad**

Lubnan ku serdemekê navenda rewşenbîriya Erebî bû û sîstema desthilatdariya wê pêka welatên din yên herêmê demokratîk bû, niha pêşerojeke tarî û aloz heye. Biryarnameya 1701’an ya Konseya Ewlekariyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dawî bi şer û pevçûnên vê dawiyê yên Hizbula û Îsraîlê anî, lê Lubnan niha jî di rewşeke aloz û nazik de ye.

Di heyamê 3 dehsalên derbasbûyî de, çend lihevhatin ji aliyê hêz û aliyên cuda yên vî welatî hatiye pejirandin. Çend biryarname di Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî de li ser Lubnanê hatiye derkirin û hêzên hevalbend (pirnejad) yên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî jî çend caran ji bo vî welatî hatine şandin, lê ev pirsgirêkên han nehatine çareserkirin.

Hetanî niha di çerçoveya biryarnameya 1701’an ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de, Îsraîlê hêzên xwe ji axa Lubnanê paşde kişandine û 5 hezar hêzên pirnejad yên Neteweyên Yekbûyî ku qirar bû biçin bo başûrê Lubnanê, di cihê xwe de cihgir bûn, nêzîk bi 10 hezar hêzên arteşa Lubnanê ku li Rojhilatê vî welatî yanî tixûbên Lubnan – Sûriyê, cihgir bûne, piraniya alîkarî ji bo avedankirina Lubnanê hatine pêşkêşkirin û kar û barên çêkirin û avedaniyê dest pê kiriye, lê Hizbula ku biryara çekjêstandina wê hatiye dan, ne tê çek kirin û ne jî dest ji çekan berdide.

Hesen Nesrula, rêberê Hizbulahê îtiraf bi şaşiya partiya xwe kir ku bûye sedema destpêbûna şer û jê re jî derket û xuya bû ku nirxa kiryarên terorîstî yên wan ên vê carê pir zêde bûye û daxwazkarê agirbestê bû, lê Hesen Nesrula piştî vê çendê ku şer hate ragirtin û çimkî dizanî ku hêzên mezin yên cîhanê karekê nakin ku canê hêzên pirnejad û navneteweyî li Başûrê Lubnanê bikeve metirsiyê, cejna serkevtinê (mehrican Elêntisar) dar xist û dest bi gef û hereşan kir. Nesrula di mîtîngeke sedan hezar kesî de ragihand ku Hizbula di vî şerî de serkevtineke Xwedayî bi destve aniye, ev şere nimûne û semboleke mezin ji bo seranserê welatên Erebî û Rojhilata Navîn bû. Stiratêjiya Hizbulayê her dirêjedan bi siyaseta dijminatîkirin tevî Amerîka û Rojavayê ye, şerê vê dawiyê bo paşdexistina projeya Amerîka ji bo Rojhilata Navîn e û hwd ... herwiha Nesrula bi ragihandina vê yekê ku her niha 20 hezar mûşek li ber destê wan de hene, gefa vê yekê kir ku ne tenê Îsraîl divêt bi lezî Lubnanê bi cih bihêle, belkî divêt hêzên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di Lubnanê de nemînin û dewleteke yekgirtî ya neteweyî bihê ser şol ku stiratêjiya Hizbulayê berçav bigre.

Hizbula tevî bizava Emel di eniyekê de ne û xwazyarê pêkhatina dewletekê ne ku Hesen Nesrula bas jê kiriye. Bizava Emel partiyeke siyasî ye û li gor rêketinnameya “Tayêf” di sala 1989’an de çekên xwe danaye û kar û barên terorîstî birêve nabe û dijberiya Amerîka û Rojavayê nake û guhdarê Komara Îslamî ya Îranê nine û her wiha Hizbula li ser bingeha baskê cudabûyî ji Emelê hatiye damezirandin.

Di rastî de Hizbula û Emel di stiratêjiya derve nikarin di eniyekê de bin û eva jî dide xuyakirin ku eniyeke wiha ne rastbînane ye û sist û bêbingeh e. Ji aliyeke din ve General Mîşêl Ewn, xaçperestê Marûnî diyar kiriye ku tevlî eniya Hizbula û Emelê dibe. Mîşêl Ewn piştî ve yekê ku di bi fermî nasîna dewleta Refîq Herîrî ku li ser bingeha lihevhatina “Tayef”ê û bi piştgiriya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî û welatên Erebî pêk hatibû, xwe parast û bi dijî vî welatî sekinî, ji Lubnanê hatibû derkirin û piştî terorkirina Refîq Herîrî zivirî Lubnanê.



Bê guman ger yekîtiya Hizbula û Emelê ku aliyê kêm her du partiyên Şîî meseb in û di hilbijartina dawîn ya Parlemanê de di eniyekê de bûn, xwedî bingehekê be, tevlîbûna Mîşêl Ew bi wan re tenê li ser bingeha dijberîkirin tevî dewleta Fuad Sînyora, Serok Wezîrê Lubnasnê yê niha ê alîgirê rojavayê dibe.

Li aliyeke dijî vê eniyê de ku Hizbula kakila wê ye, girûpa 14’ê Marsê tê dîtin ku li Seed Herîrî, kurê Refîq Herîrî û Fuad Sînyora, Serok Wezîr û Welîd Cunbelat, Rêberê “Dirûziyan” û bi giştî siyasetvanên sekolar û alîgirên rojava pêk hatiye. Eniya alîgirê Rojava, gefa Hesen Nesrula derheq bi pêkanîna dewleteke yekgirtî ya neteweyî bi kûdetaya alîgirên Îranê û Sûriyê dizanin, çimkû ew li ser vê baweriyê ne ku alîgirên Îranê û Sûriyê, Serok Komar û Serokatiya Parlemanê hene û dixwazin hêza birêveberî jî bigirne destê xwe.

Komkirina du eniyan di stiratêjiyekê de ku bi tevahî dijberî hev in, çawa dibe? Meger cuda ji vê yekê ye ku ev rê û cihên ku di lihevhatin û biryarnameyên navxweyî û navneteweyî tên berçavgirtin, divêt hemû alî bipejirînin û cî bi cî bikin. Rêketinnameya “Tayef”ê ku dawî bi şerê hundirîn yê 15 salî yê Lubnanê anî, li ser destjêberdana Hizbulahê li çekan tekez dikir. Lê ne tenê Hizbula çekên xwe nedanîn, belkî kiryarên terorîstî yên xwe di 16 salên derbasbûyî de zêdetir kir. Di biryarnameya 1559 ya sala 2003’an ya Konseya Tenahiya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî hatiye ku divêt çek ji Hizbulayê werin standin, lê Hizbula henek pê kir û şerê vê dawiyê tevî Îsraîlê tûşî Lubnanê kir ku 34 rojan dom kir. Di biryarnameya herî dawiyê de jî, yanî biryara 1701’an a Konseya Ewlekariyê li ser jêstandina çekan ji Hizbulayê bi îsrar e, lê bersîva Hizbulayê her eva ye ku me berê bal kişande ser. Lewra divêt em bizanin çima Hizbula nahê çekkirin û çima dest ji çekên xwe bernadin?

Hizbula û Komara Îslamî ya Îranê hem di warê dîrokî û hem jî di kar û barên terorîstî de li hev alîne, ne Hizbula dikare dest ji guhdarîkirina Îranê berde û ne Komara Îslamî ya Îranê jî dikare dest ji piştgirî ji Hizbulayê hilgire. Hizbula di sala 1982’an de, bi awayekî rasterast ji aliyê “Mohteşemî”, balyozê wê demê yê Îranê li Lubnanê hate damezirandin. Di sala 1983’an de, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî hêzên xwe bi merema parastina tenahiyê di Lubnanê ku bi sedema komkujiya Felestîniyan di Sebra û Şetîlayê têk çûbû, şande başûrê Lubnanê.

Her di vê salê de Hizbula bi birêvebirina çendîn kiryarên terorîstî û xwekuştinê li dijî hêzên pirnejad yên Neteweyên Yekbûyî, ew hêzane neçar kirin ku li Lubnanê biçin der. Hizbulayê di heyamê şerê Îran û Îraqê de bi rehîngirtina hevwelatiyên Rojavayî û welatên Erebî, karteke girîng û mifahdar ji bo Komara Îslamî bû ku bikare Rojava û welatên Erebî li hember azadkirina rehînan neçar bike ku di şer de piştgiriyê ji Îranê bikin yan jî çek û teqemenî û zanyariyan bifroşin Îranê. Herwiha Hizbulayê di terorkirina rêberên dijberê Komara Îslamî de, roleke girîng lîst ku yek ji wan şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û hevalên wî li xwaringeha Mîkonosê a Berlînê di sala 1992’an bû ku dadgeha serbixwe a Berlînê biryar li ser wê dozê da. Stiratejîkbûna başûrê Lubnanê ku cîranê Îsraîlê û li ser behra Medîteranê ye, ciheke herî girîng di pêşveçûna siyasetên Komara Îslamî ya Îranê de ji bo Hizbulayê bexşandiye. Karnasên warê siyasî wiha analîz dikin ku şerê vê dawiyê yê Îsraîl û Hizbulayê, bûye sedema jarbûna hêz û cihwarê vê partiyê, lê piştgiriya aborî û siyasî û piropagendeyên Komara Îslamî û Sûriyê ji vê partiyê da xuyakirin ku ev analîz û dîtin ne rast bûye.

Lewra heta demekê ku Sûriye û bi xasmanî Komara Îslamî ya Îranê hebin, dê piştgiriyê ji Hizbulayê dom bikin û heta vê demê jî ku Hizbula bi van piştrast be û xwe bi van ve girê bide, fitne û têkderî û alozkirina rewşa tenahiya Lubnanê de bidomîne û bi vî awayî jî Lubnan tu demekê rûyê aramî û tenahiyê bi xwe ve nabîne.

**Werger: Meryem Hacîpûr**

# Xozistan Herêmek Ku Her Cure Aloziyek Têde, Dibe Sedema Teqîna Na Tebahiyan

Nivîskar: "Michael Slackman"
Werger bi Soranî: Yûsif Feqîhî

Ev herême li ser çavkaniyên nift (petrol)a welat hilketî ye, di halekê de ku rûniştvanên Ereb piranî xizan û belengaz in. Di heman hal de piraniya Ereban vê yekê rexne dikin ku sermaya welatê wan ji bo avakirina Lubnanê tê terxankirin.

Tehran - Yabaray, Benî Temîm, 65 salî, di konferansekê de li bakûrê vî bajarî ku hejmareke berçav ji xizm û kes û karên van du mêrane ku bi sedema beşdarî di teqînên rêzokî de ku bû sedema kuştina gelek kesan, gunehbar hatin nasîn, hewarê dike, "alîkariyê bidin kurê min yê ciwan – tikayê dikim hevkariya min bikin".

Ev du mêre **Melik Benî Temîm**, 30 salî û **Qasim Selamet**, 42 salî, xelkê Parêzgeha Xozistanê li Başûra Rojavayê Îranê ne. Di welatekê de ku ji aliyê Farsan ve birêve diçe, ew Ereb in û bi vê çendê tên gunehbarkirin ku bi piştgiriya çend girûpên Ereb ku wekî welatiyên pile du tên mêzekirin, hewl û bizavê ji bo cudabûnê didin. Îran dixwaze bibe rêberê cîhana Îslamê û bandora xwe li ser Erebên Şîî ên Endonîzyayê û Sûriyayê zêdetir bike. Bi piştevanî ji Hizbulaha Lubnanê û dijberîkirina Rojava heya radeyekê berbipêşde çûye.

Lê di hundir de, Îranê pir hewl daye, humonojekirina xelkê bi pênaseyeke tak neteweyî pêk bîne, bi ji holê rakirina cudahiyên etnîkî wekî ziman ku eva bi xwe derdixe holê ku humonojkirin di bingeh de şaş û çewt e. Vê siyasete li ser Ereban bêtir reng vedaye.

Mistefa Elyad, pisporeke kar û barê Îranê li Qahireyê dibêje: "Di navbera Îran û welatên Erebî de û her wiha ev Erebên ku li Başûrê Îranê niştecih in, arîşe û pirsgirêk heye".

Îran welatek pirneteweyî ye, bêtir ji nîviya nifûsa 70 milyon kesî ya Îranê Fars in û nêzîkî 30 ji sedê Ereb in. Ji bilî vê çendê jî çend neteweyên din weke Azerî, Kurd, Turkmen, Belûç û Lor tê de dijîn. Di vê dawiyê de Îran tevî dijberiyeke xurt ya hinek ji neteweyan, bo mînak Azeriyan berbirû bûye ku çendîn xwenîşandanên mezin ji bo otonomî û azadiya kulturî lidarxistin.

Desthilatdarên Îranê dibêjin ku li herêmên Erebî de, girûpên cudahîxwaz di sala borî de bûne sebebê tund û tûjiyê û rêzoke teqînên terorîstî encam dan ku bûne sedema kuştin û birîndarbûna xelkeke zaf. Benî Temîm û Selamet bi beşdarîkirin di van êrîşane de hatine sûçbarkirin û girtin. Lê ji bo malbatên van du kesane axavtin û gotin tenê derheq wan buxtanên ku ev ji ber van hatine binçavkirin, ne bi cî ye,




malbatên wan kiryarên terorîstî di bêhêvîtî û nebûna hêviya vê yekê ku ji vê xizanî û belengaziyê serbest bibin ku bi sedema cudahîdananên ku ji aliyê piraniyê vê bi ser van de hatiye selimandin, dibînin. Eva rastiyek e, desthilatdarên Îranê gelek bizav û cehd kirine ku van razî bikin, lê ne karîne.

Emad Baqî, pêşengeke olî ku niha Berpirsyarê Rêxistina Berevanî ji Mafê Girtiyan e û navenda vê li Tehranê ye, dibêje: "Komara Îslamî her bi vî awayî ku Amerîka tevî Elqaîdeyê tevdigere, dê rastî pirsgirêkên terorîzma hundirîn bibe".

Ew dibêje merema wî eva ye ku her du hikûmetên han li cihên bikaranîna rêbazên aqilmendane, ji hêz û qawetê mifahê werdigirin. Malbatên wan dibêjin: Benî Temîm û Selamet di roja 11'ê Marsê de tevî 15 mêr û du jinên din hatine girtin, vekolîna şeş kesan hate sekinandin, di halekê de ewên din hatin gunehbarkirin û cezayê mirinê bi ser wan de hate sepandin.

Tirs û bêhêvîtî bûye sedema vê çendê ku bêtir ji 150 kes ji endamên malbat û hevalên wan bihêne Tehranê, heya ji desthilatdaran bixwazin cezaya kuştina wan hilbiweşînin. Gava yekemîn a wan hevdîtin tevî birêz **Baqî** bû. Yeqûb Benî Temîm, birayê mezin ê Melik Benî Temîm, di destpêka gotinên xwe bi rêzdar Baqî re, dibêje: "cezayê mirinê bi ser wan de hatiye sepandin, çunkî wan îtiraf kiriye, îtirafa wan di bin îşkenceyê de bûye, wan çi nekiriye".

**Baqî** ku çend rojan bi guhdan li şikayeta kes û kerên girtiyan borand, pirs kir ku gelo di rastî de wan tevî rêxistinan han têkilî heye ku li navenda parêzgeha Xozistanê, Ehwazê bombe danîn? Birayê Benî Temîm serê xwe daxist û got: "Em nizanin".

Piştre birêz Baqî, wekî evê ku berê bersiv zanîbe ku ew kes endamên vê girûpê bin, dibêje: "Dewlet dikare wan bi cezayê girtîxaneyê mehkûm bike. Em tenê dixwazin îdamê bidin rawestandin".

Desthilatdarên Tehranê tekezê dikin ku tu ferq û cudahîdahiyek di navbera Ereban û kêmaniyên din yên Îranê de dananên. Bo mînak basa wê Erebiya kilasîk dikin ku di xwendingehan de tê gotin, ew dibêjin Serokê welat, Ayetulah Elî Xameneyî bi xwe Azerî ye.

Îran hikûmetên Rojava bi piştgiriya pere û hevkarîkirin bi girûpên berpirs ên tund û tûjiya Ehwazê gunehbar dike. Renge ji xwe ve be, lê balyozeke Ewropayî ku li Tehranê ye, got: "Li gor raporeke dezgeheke nûçevaniyê ya welatê wî, ev rastiye der dikeve ku Rojava aliyê kêm piştevaniyê li yek ji wan girûpên cudahîxwaz dike".

Lê eva ku her wiha daxwaza Îraniyan e, eva ye ku dixwazin bal û giringiyeke bêtir bi rewşa kulturî, siyasî û civakî ya pareke zaf ji girûpên etnîkî bihê dan, bo nimûne Ereban. Birêz Baqî, dibêje: "Ez li ser vê baweriyê me ku li cihê vê yekê ku buxtana terorîstbûnê ji

xelkê bidin, divêt em hewl bidin ji sedemên wê têbigihîjin".

Xozistan cihek e ku dijberîkirina wê dibe sedema kerb û turebûnê. Ev herême li ser çavkaniyên nift (petrolê)ê hilketî ye, di halekê de rûniştvanên Ereb piranî xizan û belengaz in. Di heman hal de piraniya Ereban vê yekê rexne dikin ku sermaye û heyîna welatê wan ji bo avadankirina Lubnanê tê terxankirin.

Rojnameya Pan Erebî ya "**Asharqalawsat**" ku li Lubnanê derdikeve, di vê dawiyê de raporak derheq Xozistanê nivîsandiye ku akinciyên vê deverê li dijî hikûmetê û Hizbulaha Lubnanê dirûşm nivîsandine û daxwaz kirine li cihê maytêkirin di kar û barên hundir yê Lubnanê, welatê wan bihê çêkirin.

Hinek ji gazinde û lomeyên malbatên mehkûmbûyan, balkêş in. **Semîre**, hevjîna Selamet got: "bi baldan bi vê çendê ku Xozistan li nêzîk tixûbê Îraqê hilketî ye, me êş û elemên zaf di dema şerê tevî vî welatî kişandine, ewa ku derheq me dikin, bêedaletî ye. Me çi xirabiyek nekiriye. Xwedê dizane ku me tu xirabiyek nekiriye".

Birêz **Baqî** nikare ji hinek rênîşandanan bêtir tişteke din ji bo wan bike. Lê ev nûnerên desthilatdaran e û pira navbera lêqewimiyên Ehwazê û rayedarên Tehranê ye. Semîre, bi tûreyî ve dibêje: "Pirsgirêka me tenê ne aborî ye, belkî kulturî ye, ew awayê liberkirina kincên me bi guneh dizanin". Merema vê ji peyva wan, cîranê Fars yê wan in.

Gazinde, girîn, seh bi cudahiyan di nava odeyan de tê dîtin, çaxekê zarokek ji kesekê guhdarî dike, bavê wê/î hatiye darvekirin, çavê wê/î tijî ji hêsir û rondik dibe, yan bi sedema Erebbûna wan, kar ji bo malbatên wan dest nakeve, demekê malbatên wan diçin, **Baqî** bi parêzê ve li hemberî hevdderdkeran re dibêje: "Terorîstan fîlmeke vîdeoyî ji teqînan girtiye ku ketiye destê desthilatdaran".

Elbelad dibêje: "Eva bi ronî û zelalî derketiye holê ku gelek hêsan e tevî biyaniyan hevrêtî bihê kirin heya xelkê navxwe, her demekê Îranê daxwaz ji Erebên derveyî sînoran kiribe, karî ye dijminayetiyeke giştî li dijî Amerîka û Îsraîlê bixe rê".

Lê demekê ji bo nifûsa Ereb ya xwe ev base tê rojevê, berpirsyariya yekem peydakirina erzaq û xwarinê, kar û cihê veheviyanê hewce ye. Eva her ew tişte ye ku malbata du tawanbaran bas jê dikin, çima rexneya wan ji derkirina vî cezayî yê bûye sedema rêxistinekê bo xuyakirina bêhêvîtiya wan?

Yeqûb Benî Temîm, dibêje: "Min 9 bira û xûşkek hene, di nava hemûyan de tenê vî birayê min ku hatiye girtin, kar dikir. Sedema vê yekê çi ye? Tenê ji ber vê çendê ye ku em Ereb in".

**J: Rojnameya "New York Times"ê hatiye wergirtin**

**Werger bi Kurmancî: Azad**

# Gerek Kurt Di Dîrokê De ...

**Amadekar: Nûredîn Sofîzade**

**01.10.1908:** Şêx Selam Barzanî şoreşeke mezin li dijî Osmaniyan dest pê kir. Osmaniyan ku seh bi hêz û xurtbûna wê şoreşa mezin kirin, li rêya Waliyê Mûsilê ve daxwaza gotûbêjê tevî Şêx Selam Barzanî kirin. Şêx daxwaziya azadiya axa Kurdistanê û xwendin û nivîsandin bi zimanê Kurdî kir. Li aqibetê Şêx Selam bi destê îxanetê bi Osmaniyan hate teslîmkirin û sêdaredanê.

**02.10.1979:** Pêkhatina Komîteya "Zagros"ê ya PDK Îranê li serûbenda xurtbûna serhildana gelên Îranê li dijî rejîma Pehlewî, Komîteya Navendî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li Bexdayê biryar da li ser navê Komîteya "Zagros" endamên rêberiya partiyê vegerine hundirê welat bona rêxistina xelkê. Eva bû ku Dr. Qasimlo û çend endamên din yên rêberiyê çûn û di bajarên Tehran, Urmiye, Mehabad, Şino, Bokan, Seqiz, Sine de heta serkevtina şoreşê dest bi karê nepenî kirin.

**2-10-1981:** Elî Xameneyî bû Serok Komarê Îranê.

**2-10-1982:** Bi hegera teqîna bombeyekê li Tehranê, 60 kes hatin kuştin û 700 kes jî birîndar bûn.

**3-10-1932:** Dewleta Îraqê bû endamê Rêxistina Neteweyan ku piştî wê demê ew rêxstine bû Rêxistina Neteweyên Yekbûyî.

**4-10-1949:** Binkeya dayîm ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî li bajarê Niyoyorkê vebû.

**4-10-1963:** Li Afrîqayê welatê "Gambiya" serxwebûna xwe ragihand.

**4-10-1978:** Pap Jan Pulê Yekem, rêberê olî yê Katolîkên cîhanê koça dawiyê kir.

**5-10-1942:** Leşkerên Almana Nazî piştî wê ku parek ji axa Soviyetê girt, pitir ji 10 hezar kes ji Cihuyan li wir qir kir.

**5-10-1986:** Hêzên rejîma Komara Îslamî cihê vehewiyana Pêşmergeyên PDK Îranê di nav rezê Hacîava ku ketiye 500 metriya rêya Bokan – Miyanduavê dorpêç kir û da ber guleyan. Mixabin 8 Pêşmerge ku navên wan li jêr de hatiye, şehîd bûn:

1- Mihemed Xorşîdî, 2- Silêman Aramiş, 3- Sidîq Ehmedî, 4- Mihemed Rehîmî, 5 – Qasim Feyzî, 6- Hemze Iftixarî, 7- Rehman Mameş, 8- Mihemed Çopanzade.

**6-10-1944:** Leşkerên Soviyetê welatên Çekoslovaya û Mecaristanê girtin û leşkerê Almanan li wir der xist.

**06-10-1967:** Şehîdbûna Çegwara Şoreşvanê mezin ê Amerîkaya Latîn.

**06.10.1989:** Li şereke giran di navbera hêzên Komra Îslamî û Pêşmergeyên PDK Îranê de li gundê Diza Mirgewer 6 Pêşmerge ku navê wan li jêr de hatiye şehîdbûn: 1- Bayezîd Bayezîdî 2- Silêman Ihsanî 3- Bayezîd Remezanî 4- Cefer Şehsewar 5- Mihemed Esrisî 6- Seîd Serayî.

**06.10.1978:** Dewleta Îraqê bi sûça tevdaniyê, Xomeynî li wî welatî der xist.

**06.10.1958:** Mele Mistefa Barzanî piştî 13 salan mana li Rûsiyayê, hate Kurdistanê. Hêjayî gotinê ye ku Barzanî tevî 500 siwarên xwe piştî hiloşandina Komara Kurdistanê di sala 1947'an de çû bo Rûsiyayê.

**06.10.1993:** Piştî rizgarbûna Kurdistana Îraqê ji destê rejîma "Bees"'ê, termê Mela Mistefa Barzanî û kurê wî Îdrîs Barzanî li gundê "Helec" a ser bi devera Mirgewer a Urmiyê ji bo Kurdistana azad li devera Barzan hate vegerandin.

**07.10.1985:** Teha Heqteleb, Şêwirmendê Komîteya Navendî a PDK Îranê li girtîxaneya "Êvîn"'ê de hate tîrbarankirin.

**08.10:** Roja Cîhanî a dijî îdamê

**08.10.1940:** Li dirêjiya şerê duyem ê cîhanî, leşkerê Almaniya êrîş kire ser "Romanî" û dagîrkir.

**08.10.1962:** Cezayir bû endamê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî.

**09.10:** Roja Cîhanî a Poste û Gehandinê.

**09.10.1956:** Şêx Mehmûd, koça dawiyê kir.

**10.10.1922:** Yekemîn Wezareta Kurdî bi serokatiya Şêx Ebdulqadir di Hikûmeta Paşayetiya Kurdistanê de hate damezrandin.

**10.10.1988:** Ehmed Kohgerd, fermandarê hêza "Beyan" di şerekê de tevî hêzên Komara Îslamî hate şehîdkirin.

**10.10.2005:** Mesûd Barzanî wek yekemîn kesê Fermî yê Kurd û Serokê Welatekê ji aliyê Cor Buş, Serok Komarê Amerîkayê ve li koşka Sipî hate pêşwazîkirin.

**11.10.1993:** Osman Sebrî, kesayetiyê navdar, zimanzan û nivîskarê Kurd koça dawiyê kir.

**12.10.1492:** Peydakirina Parzemîna Amerîka.

**12.10.1813:** Îmzekirina peymana **Gulistan**ê di navbera Îranê û Rûsiyayê de.

**13.10.1927:** Bi ger ketina yekemîn çala niftê(petrolê) li Kerkûkê.

**14.10.1953:** Destpêbûna şerê "Kerîmê" di navbera Rûsiyê – Turkiye – Birîtaniya û Firansayê de

**14.10.1988:** Yekemîn Konferansa Navneteweyî li ser pirsa Kurd, li jêr navê **nasname û çand** li Parîsa paytextê Fransayê de hate lidarxistin. Ew konferanse bi hegera xebata zaf a Dr. Qasimlo û nasandina Kurdan bi cîhanê ji aliyê wî ve bû.

**15.10.1909:** Kovara "Meşrotiyet" li Parîsê hate çap û belavkirin.

# Carnameya Pêşgîrî Ji Tund Û Tûjî Li Dijî Jinan

**Beşa 3 û dawî**

Cehd bikin ji bo garantîkirina rewşa jiyana jinên ku rastî tund û tûjiyê hatine, heke hewce be zarokên wan ji alîkariyên taybetî weke hêzpêdan, hevkarî di serperestî û zêrevaniya bi ser zarok û jiyana wan de, dermankirin, şêwirmendî û ravêjkarî, xizmetên saxlemiyê û civakî behremend bin. Navend û bername û rêxistinên alîkarker divêt gavên hewce ji bo xurt û jordebirina tenahî û hêz û şiyanbexşîna cendekî û hundir ya wan hilbigirin.

- Li xizîneya (bodce) welat, bi qasê hewce ji bo xebatên têkildar bi nehêlana tund û tûjiyê terxan bikin.

- Divêt ji bo fêrikirin û elimandina hêzên ewlekariyê û berpirsên dewletî yên berpirsiyar di cîbicîkirina siyasetên taybet bi pêşgîriyê, lêkolîn û cezadan ji bo tund û tûjî li dijî jinan, gavên micid û pêwîst hilbigirin ku ev kesane li hemberî hewcehiyên jinan



berpirsiyar bin.

- Divêt gavên hewce bi taybetî di warê hînkirin û perwerdehiyê de, werin avêtin ku sembolên civakî û kulturî yên liv û riftarên jin û mêran bihê guhartin û cudahîdanan û riftarên edetpêkirî û her terze riftarên ku li ser bingeha bindestî yan jî serbestiya zayendekê ye û çarçoveya riftarên jin û mêran pêk tîne, ji nav bibin.

- Divêt lêkolîn, komkirina zanyarî û serhejmariyan, bi taybet di warê tund û tûjiyên malbatî û terzên tund û tûjî li dijî jinan belav bikin û teşvîqker bin ji bo lêkolîn di warê sedem, naverok û kakil, qasa micid bûn, encama tund û tûjiyê li dijî jinan û rade û qasê bandora gavên bi merema pêşgîrîkirin ji tund û tûjiyê û her wiha qerebûkirina ziyan û xisara tund û tûjiyê li dijî jinan, ev serhejmarî û zanyariyane divêt li ber destê hemû kesekê be.

- Divêt gavên pêwîst bi merema nehêlana tund û tûjiyê nemaze di pêwendî tevî wan jinan ku li hemberî tund û tûjiyê bê teqet in, bihê hilgirtin.

- Di wan raporan de ku derbarê sened û belgeyên mafê mirovan ku bi Rêxistina Neteweyên Yekbûyî re tên pêşkêşkirin, zanyariyên derheq bi tund û tûjî li dijî jinan û gavên avêtî bi merema cibicîkirina daxwazên vê carnameyê, werin berçavgirtin.

- Divêt ji bo danîna pilana karî bi merema cîbicî bûna bingehên vê daxuyaniyê bin.

- Divêt alîkariya çalakî û tekoşîna bizav û rêxistinên navdewletî bikin û di asta xwecihî, neteweyî û herêmî (nawçeyî) de hevkariya wan bikin.

- Divêt rêxistinên herêmî yên navdewletî ku tê de endam in, hay bidin ku heke ji wan re çê be, ji nav birina tund û tûjî li dijî jinan di pirograma xwe de bicî bikin.

**Madeya 5:**

- Organ û bîroyên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî divêt bi qasê ku di şiyana wan de hebe, alîkariya nasandin û bidestveanîna wan maf û bingehan bidin ku di vê carnameyê de hatine. Bo mînak divêt:

- Hevkariyê tevî geşekirina alîkariyên nawçeyî û navneteweyî bikin ku armanca wan pênasekirina stiratêjiyên herêmî ji bo xebat li dijî tund û tûjiyê, guhastina tecrûbeyan û pirogrameyên aborî yên taybet bo ji holê rakirina tund û tûjiyê li dijî jinan e.

- Divêt hayderê wan civîn û semînaran bin ku merema wan pêkanîn û geşandina zanyariyên navbera hemû takekesan hemberî pirsa ji navbirina tund û tûjiyê li dijî jinan e.

- Alîkariya geşandina hevaheng û hevpariya navbera sazî û navendên taybet bi mafê mirovan yên ser bi Rêxistina Neteweyên Yekbûyî bikin hetanî ku pirsa tund û tûjî li dijî jinan bi awayekî bibandor bikeve ber bal û rayan.

- Di wan şiroveyên ku ji bo sazî û navendên ser bi Rêxistina Neteweyên Yekbûyî derheq pirsgirêk û berçaviyên civakî amade dikin, weke: raporên dewreyî yên derheq rewşa civakî ya cîhanê, nirxandina meyl û elaqeyan di tund û tûjî li dijî jinan bicî bikin.

- Rêzbendiya pilankarî yan namîlkeyên rênûmayîkirinê ên derheq bi tund û tûjî li dijî jinan, belav bikin û ev gavên ku di vê carnameyê de îşare pê hate kirin, bicih bikin.


- Heke çê be pirsa ji holê rakirina tund û tûjiyê li dijî jinan, di cîbicî kirina berpirsiyariyên xwe di birêvebirina belgenameyên taybet ên mafên mirovan de girê bidin.

**Madeya 6**

- Tu tiştek di vê carnameyê de nabe tu yek ji madeyên yasayî yên welatekê yan lihevhatin û peymaneke civakî yan her belgenameyeke din ku di welatekê tê cîbicî kirin û ji bo nehêlana tund û tûjiyê li dijî jinan rontir û berfirehtir in, bixe bin bandora xwe.

**Werger ji Farsî: Meryem**
**Jêder: Malpera "iran-emrooz"**

# Otîkirina Memikê Keçan Di Kamrûnê



Singê min Otî kirin, min niha jî êş her heye

Piraniya civakên paşdemayî berpirsiyariya têkiliyên "sex"ê dixin stûyê jinan û keçan û li ser vê baweriyê ne ku jin bi sedema xweşik û ser û beriya endamên laşê wan, bala mêran dikişîne aliyê xwe.

Civakên bi vî awayî li ser vê baweriyê ne ku jin divêt karekê bikin ku bala mêran ji bo aliyê xwe nekişîne. Jin di wan civakane de divêt ji bo parastina heya û şerefa xwe, xwe bipêçivîne û û herwiha cendekê wan xuya nebe.

Di welatê Kamrûnê û hinek welatên Afrîqayê de ji bo ku jin bala mêran ber bi aliyê xwe nekişînin, kareke kirêt, hov û nemirovane derheq bi jinan dikin, ev jî otîkirina sing (memik)ê jin û keçan e. Di welatê Kamrûnê de bona vê çendê ku keçên genc û tazegihîştî bala mêran ji bo aliyê xwe ranekêşin, ji aliyê dayîk û bavê wan memikê wan tên otîkirin da ku tu hest û hezeke rakêşana zayendî nebin, çimkî ev dibêjin ku geşekirin û mezinbûna memikê keçan nîşaneya serhildana hesta zayendî ye û ji bo vê ku keç tûşî karê nebaş nabin, divêt memikê wan bihên otîkirin.

Li gor rapora nûçegihanê "BBC"yê, otîkirin di Kamrûnê yê bûye deb û edet û 26 ji sedê ya keçên Kamrûnê ku temenê wan digihîje balixbûnê, ji aliyê dayîk û bavan memikê wan tên otîkirin ku niha zêdetir ji 4 milyon kaçên Kamrûnê mamikê wan hatiye otîkirin.

Ev kare zêdetir bi destê dayîkan tê encam dan, herçiqas ku ev kiryare ji aliyê dewleta Kamrûnê hatiye qedexekirin, lê xelkê wî welatî vê biryarê cîbicî nakin û li ser vî karê xwe berdewam in.

Welatê Kamrûnê biryara sezadana 3 sal girtinê ji bo van kesan daye ku vî karî dikin.

Lêkolînan daye xuyakirin ku ev kare nabe sedema kêmbûna eleqe û heza "sex"ê û zaf car jî dibe sedema zêdebûna vê.

Ya balkêştir eva ye ku pir caran keç ji bo vê ku ji xwendin û pêkanîna jiyana hevbeş paşde nemînin, razî dibin ku dayîkên van bi vî awayê nemirovane memikê wan otî bikin.

**Jêder: "BBC"**

# Bangewaziya Ayrînxan, Sekretera Giştî Ya Rêxistina Efûya Navneteweyî Ji Bo Rakirina Kevirbaranê Li Îranê

Ayrînxan, Sekretera Giştî ya Rêxistina Efûya Navneteweyî, ji hikûmeta Îranê xwast, cezaya kevirbaranê ji holê rake.

Sekretera Giştî ya Rêxistina Efûya Navneteweyî, bi hinceta Roja Cîhanî ya Qedexekirina Îdamê da xuyakirin û got: "Ez bi kûrahiya dilê xwe tevî wan kesane me ku di Îranê de bi wêrekiyek zaf û bi xebatên pir mezin, ji bo dawî anîn bi cezaya Îdamê bi terzê kevirbarankirinê xebatê dikin".

Gelek bixof e ku serbarê bi dawî anîna vê curê kuştinê ku ji aliyê Serokê Dezgeha Dadê di sala 2002'an de biryara wê hatibû girtin, hin rayedar û karbidestên rejîma Komara Îslamî ji bo berdewamkirina (domandina) vê kiryara nemirovane cehd û xebat kirine.

Îdam bi rêya kevirbaranê kareke kirêt û hovane ye, ev cezaye ku tenê ji bo zêdekirina êş û azara goriyan tê bikar anîn û tund û tûjiya zatî ya îdamê du hember dike.

Kevirbarankirin divêt bihê hilgirtin û ez ji Îranê dixwazim ku bi lez vî karî bike.

# 275 Milyon Zarok Di Cîhanê De Li Ber Şopa Tund Û Tûjiyê Ne

Rapora herî nû ya "UNICFE"ê ku di weşanên welatê Otrîşê de hatiye belavkirin, dide xuyakirin ku 275 milyon zarok di cîhanê de li ber şopa tund û tûjiya malbatî ne.

Di vê raporê de hatiye ku: "lêdan û kutana zarokan hertim weke pirsgirêkeke nepenî di hemû welatan de tê xuyakirin û di salê de 83 hezar zarok, li malbatên xwe de tên lêdan û êşandin".

Li gor vê raporê tund û tûjî dijî zarokan di malbatê de dibe sedema pirsgirêkên ruhî, xwandinê û pêwendiyên civakî.

"UNISFE" ji hemû dewletan dixwaze ku tundî û dijwariyên ku li dijî zarokan di malbatan de tê meşandin, şirove bikin û yasayên jêhatî bi dijî lêdana zarokan di welatên xwe de pesend bikin.

**Jêder: "IRNA"**

# Pêşgîrtin Ji Pişikdariya Jinekê Di Pêşbirkêyên Raliyê



Rojnameya "Guardian" çapa Londonê, roja çarşem, 4'ê Oktobera 2006'an, derheq berlêgirtin ji jinekê di pêşbirkêyên Raliyê li Îranê de belav kir.

Li gor ragihandina vê rojnameyê, Lale Sadiq, ya 29 salî ku ji bo pişikdarîkirin di pêşbirkêyên Raliyê di yarîgeha Azadî ya Tehranê, ber bi aliyê tirombêla xwe diçû, rastî berlêgirtina Memûrên Herasetê hat û jê re hate gotin: "Te mafê beşdarîkirin di pêşbirkêyê de tune ye".

Hêjayî gotinê ye ku ev jine du salan berî niha bibû şampiyona pêşbirkêyên Raliyê.

**Jêder: "BBC"**

# Xelata Netirsî Di Rojnamevaniyê De Pêşkêşî 3 Jinan Hate Kirin




Rêxistina Navneteweyî ya Nûçegihanên Jin, xelata **cesûrî û netirsî di rojnamevaniyê de** ya sala 2006'an, pêşkêşî "Cîl Karol", "May Çîdyak" û "Gao Yû" kir û xelata taybetî ya rêzgirtin ji xebatên pisporane bi navê **bidestxistiyên jiyanê** pêşkêşî "Êlêna Ponyatofska Amûr" kir.

Ev xelatane di rê û resmekê de li 24'ê Oktoberê li bajarê "New York"ê û herwiha di 2'ê Novambera 2006'an de li bajarê Losancelesê dê bihên pêşkêşkirin. Xelata **cesûrî û netirsiyê di rojnamevaniyê de** ji sala 1990'an bi van jinan tê pêşkêşkirin ku di rewşên xirab û bi tirs de xebata xwe didomînin.

Xelata **bidestxistiyên jiyanê** bi wan nûçegihanan tê pêşkêşkirin ku bi xebata xwe rêyê ji bo nifşa jinên pêşerojê hêsan û vekirî dikin. Yên ku xelata îsal birin ev in:

**Cîl Karol,** nûçegihana 28 salî ya rojnameya "Christion Science Monitor"ê ye ku di 7'ê Janviya 2005'an li Îraqê tevî ajotkar û wergêrê xwe hat revandin, lê li 30'ê meha Marsê serbest hate berdan û dîsan çû bû Amerîkayê.

**May Cîdiyak**, 43 salî ye û nûçegihana kanaleke televîzyonî ya Lubnanê ye. Piştî teqîna bombekê ku di bin maseya wê hatibû danan, dest û pêyê xwe yê çepê ji dest dan, lê dîsan xebata xwe didomîne.

**Gao Yû**, nûçegihana 62 salî ya aborî û siyasî ya dîwarê Çînî ye ku di sala 1993'an de bi sûça kifşkirina sir û razên dewletî bi cezayê girtîxaneyê hate mehkûmkirin û di meha Marsa 1999'an de serbest hate berdan.

**Êlêna Ponyatofska Amror**, nûçegihana 74 salî ya Firansî ye ku nivîskara roman, kurteçîrok û gotarên cur bi cur e ku berhemên wê bi zimanên cuda cuda hatine wergerandin. Ev jine di heyamê şerê cîhanî yê duyem de sefera Mekzîkayê kir. Ev yek ji avakerên "arşîva fîlma neteweyî" ye û yek ji rojnamevanên navdar ya Mekzîkî ye. Di sala 1979'an de dest bi belavkirina Kovara Femînîstî ya "FM"ê kir. Di sala 1979'an de yekemîn jin bû ku xelata **jornalîzma neteweyî ya Mekzîkayê** wergirt. Berhema wê ya herî bi nav û deng **qirkirin li Mezîkê** ye.

**Jêder: "Shahrzad News"**

# Rêxistina Cîhanî Ya Saxlemiyê Derheq Zêdebûan Tund Û Tûjiyê Di Malbatan De Hişyarî Da

Rapora Rêxistina Cîhanî ya Saxlemiyê dide xuyakirin ku zêdetirîn tund û tûjî li ser jinan ji aliyê mêrê van tê kirin û tund û tûjî di herêmên gundan de zêdetir e. Li gor nûçevaniya "**Roeuters**"ê ji Londonê, vê Rêxistinê asta tund û tûjiyê bi dijî 24 hezar jinan di malbatên Asiyayî, Afrîqayî, Amerîkaya Başûr û Ewropayê de nirxandiye. Nirxandina han dide xuyakirin ku hevjînê jinan zêdetir ji her kesekê di meşandina tund û tûjiyê de rolê dilîzin. Bêtir ji 1 ji 4'ê ya jinan ku di van 13 herêmane de rewşa wan hatiye nirxandin, aliyê kêm carekê tund û tûjiya mêrên xwe di jiyana xwe de ceribandine.

Hêjayê gotinê ye ku di vê nirxandinê de jinên Bengiladeş, Berazîl, Etyopiya, Japon, Nomîbya, Perû, Samova, Serbistan, Montînegro, Tayland û Tanzanîkayê ketine ber nirxandinê.

**Jêder: www.irwomen.com**

# Ceferqulî Zengene Helbestvanê Kurdistana Xerîb

Heke em binihêrne dîroka neteweya Kurd, em dibînin ku hertim di dirêjahiya dîrokê de serbarê parvekirina welatê me Kurdistanê û herwisa êrîşa hovane a desthilatdarên zal bi ser Kurdistanê de bona tepeseriya hawara azadîxwaziya vê netewê, desthilatdaran ji bombeya kîmyayî û komkujî û jînosaydê mifah wergirtine û ev tepeseriya hovane tenê taybet bi vî serdemî nine.

Heke di rabihurî de çekên kîmyayî tune bûn, dujminên me ji rêyên din ve dixwastin neteweya Kurd ji nav bibin ku mînaka berçav ya vê dûrxistina bi kom a sedan malbatên Kurd di serdemê desthilatdariya Sefewiyan, Efşariyan û Qacariyan bo Xurasanê ye ku xwastine bi vî awayî nasnameya neteweyî a Kurdan bimirînin û ji nav bibin. Niha piştî derbasbûna pitir ji 500 salan bi ser yekemîn koçberkirina wan bo Xurasanê, em dibînin nifûsa Kurdan di vê herêmê de gihîştiye 2 milyon kesî ku ne tenê nasnameya xwe a netewî ji bîr nekirine, belkû bi avakirina rojname, belavok û sazî û girûpên stiran, muzîk û folklora Kurdî bi dil û can ji nasnameya xwe berevanî kirine û heta peyivînên wan jî bi zimanê Kurdî ê 500 salan berî niha ye ku bê şik û guman ji bîrkirina zaf ji peyvên Kurdî û têketina peyvên biyanî di nava zimanê me de encama heman siyaseta asîmîlasiyonê ji aliyê Fars, Turk û Ereban ve ye, lê bi vî halî jî gelekî ciyê şanaziyê ye ku Kurdên Xurasanê karîne van peyvên şîrîn û bedew ên Kurdî ji siyaseta asîmîlasiyonê biparêzên.

Bê şik û guman heke em îro rojê gewahyarê avakirina dameziravên weke **Kirmanc** û girûpên sitran û muzîkên weke **Koma Baran** û rojnameyeke bi navê Kirmanc di Xurasanê de ne, lê şik û guman di vê yekê de nîne ku di vê rêyê û di dirêjiya van 5 sedsalan de, gelek kesan zor û zehmetî dîtine û heta di rêya îsbatkirina nasnameya Kurdbûna xwe û parastina ziman û çanda xwe de canê xwe gorî kirine, lê navê van hatiye ji bîrkirin. Di vê navberê de û di nava van Yusufên dûrketî ji Kenanê, zana û helbestvanên navdar hebûne ku nevê **Ceferquliyê Zengene** mîna stêrkeke ronahî nava gişt van zana û helbestvanan bi şewqa xwe dixemilîne û diçilvilîne.

Ceferqulî ku renge heya îro rojê jî kêm kesî navê wî anî be lê bi cehd û tekoşîna kesên xebatkar û mandînenas weke Kelîmulahê Tewehudî ji vê bênaviyê derketiye û bûye sembol û berjenga helbestvan û hozanvanên di nava Kurdên Bakûra Xurasanê de. Lê pirs eva ye ku erê gelo Ceferqulî kî ye û çima heya niha di nava piraniya Kurdan de weke serbazeke bê nav û nîşan ma ye? A rastî eva ye ku siyaseta îstimargeriya desthilatdarên zal bi ser Kurdistanê de û her wisa dûr mana Kurdên Xurasanê ji hevtuxmên xwe ên din, bixwe bûye sebebê bê naviya vî arifê mezin. Ceferqulî Zengene bi jiyê dirêj û bikêr yê xwe çavkaniyeke mezin ji muzîk û tore û îrfanê ji neteweya Kurd, bi taybetî ji Kurdên Xurasanê re bi dîharî hêlaye, ku heya niha bi egera jevbelavî û windabûna helbestên wî, bi awayeke nivîşkan û bê ser û ber hinek ji helbestên wî, yanî dilopek ji behra helbestên wî dest me ketine. Helbestên Ceferqulî zaf bûne, lê çimkû wî bi xwe helbestên xwe nedinivîsandin, belkî kesên din ew helbest ji wî guhdarî dikirin û jê re dinivîsandin, lewra piraniya helbestên wî yan ji nav çûne, yan jî hêja di welatên din de bi awayekî bê ser û ber hinek beşên vê mabin. Niha tenê dîwaneke îrfanî ji Ceferquliyê Zengene bi cî maye, ku ew jî bi cehd û tekoşîna zana û nivîskarê Kurd, Kelîmulayê Tewehudî hatiye komkirin û ji navçûnê rizgar bûye. Ceferqulî serdana piraniya welatên Asyayî û Afrîqayî kiriye û bi komkirina zanyarî û tecrûbeyan bi geryana xwe û bi tiştên ku bi çavê xwe dîtine, gulistanek ji xwe bi cî hêlaye. Ew çûye welatên Hindistan, Efxanistan, Tacîkistan, Ozbekistan, Turkemenistan, Azerbaycan, Qefqaziya, Osmanî, Îraq, Erebistan, Sûriye û Misrê û li wir gelek helbest gotine ku heya niha weke pirtûk negihêştine destê tu kesî û heya gelek ji van helbestan jî ji nav çûne. Ceferqulî nasyariyeke tewaw bi zimanê van welatan re hebû û bi wan zimanan helbest jî gotine ku eva bi xwe bûye sebeb da ku ew di vî karî de çêtir helbestan bibêje û gelek şareza be. Şêweyên gotina helbestên wî bi egera taybetmendiyên zimanê Kurdî tevî helbestên helbestvanên din ferq û cudahî heye. Her wiha xezeliyatên wî tevî xezeliytên helbestvanên din di warê kêş ve ferq û cudahî heye û şêweyên taybet bi xwe hene.


Ceferqulî tenê helbestvan, muzîkvan yan jî arifek nine, belkî ew mamostayê exlaq jî bûye ku bi kiryar û riftarên xwe ên baş, fikirîna baş û bi jiyana baş, cangorîtî fêrî dersxwanên xwe kiriye û xwe ji karên kirêt ên cîhanê dûr xistiye û rû dikire karên menewî.

Ceferqulî fîlozofek bûye, çimkû di tevaya temenê xwe de li pey zanist û tecrûbeyan bûye û ji niqteyekê çûye niqteyeke din û ji welatekê çûye welateke din û bona bidestveanîna zanyariyên zaftir dest bi lêgerîn, taqîkirin û geryanê kiriye. Ew bi tevaya wateya peyvê zana ye. Çimkû mirov kesekî weke wî nabîne ku ji hemû kes û karên xwe dest hilgirtibe û bona gihîştin bi meremên xwe temenek di çol û çiya û di xerîbiyê de derbas kiribe.

Heke Mewlewî daxwazkarê Şemsê Tebrîzî bû, Ceferqulî li pey dermanê derdê xwe, li pey evîna dilê xwe yan li pey "Melwarî" bû. Ceferqulî helbestvan, hozanvan, gerîde, mamostayê exlaq, arif, şirovekar – Dîroknas û muzîkvanekî şareza ye. Piraniya helbestên Ceferqulî awayê dîmenî hene û mirov dibne nava kûrahiya fikr û xeyala mijara helbestên xwe de. Helbestên wî gelek dewlemend û watedar in, yanî gişt taybetmendiyên helbestên têr û tejî û pir naverok di helbestên wî de hene.

Ceferqulî mirovekî gelek cesûr û gernas bûye û heta di helbestên xwe de tenê daxwazek ku ji Xwedê kiriye eva ye ku Xwedê wî bikete xwediyê îlm û zanisteke xurt. Wî qet daxwaza malê dunyayê ji Xwedê nekiriye û piştî mirina wî tenê torbe û tenbûrek ji wî bi cî ma. Wî qet li hemberî tu kesî de serê xwe neçewandiye. Wî tenê bîr ji zanînê û hunerê dikir û rêz jê digirt. Serbarê vana Ceferqulî bi çar zimanê Kurdî, Farsî, Turkî û Erebî helbest gotine ku di Îranê de tenê Ceferqulî ye ku bi çar zimanan helbest stirîne. Helbet stirîna helbestan bi çar zimanên naskirî ên Rojhilata

Amadekar: Mecîd Cinîkanlû
Wergeran: Şehab Xalidî




Navîn hunera helbestvanê Kurd weke Ehmedê Xanî û Melayê cezîrî ye. Erê gelo ev Ceferqulî kî ye û çima koçberî çol û çiya û sererdên bîhanî bûye?

Ceferqulî Zengêlanlû ji îleke Kurd bi navê Zengene û li malbateke sade a gundî li geliyê Emaret li bakûra rojhilata Qûçanê di parêzgeha Xurasanê li gundê Gûganê di sala 1320'an a Heyvî de di serdemê Fethelî Şahê Qacar de hate dinê. Navê bavê wî Mela Reza Qulî bûye. Ceferqulî di zarokîniya xwe, bavê xwe ji dest dide û apê wî Hecî Elîesxer bi diya wî a bêvejin re dizewice û serperestî û perwerdehiya Ceferqulî digire stûyê xwe. Elîesxer di 7 saliyê de Ceferqulî şande xwendingehê da ku li cem Melayê gund mela Berat, dersa Quranê hîn bibe. Lê Ceferqulî gelek hez li çûna xwendingehê nedikir, lewra naçe xwendingehê. Ceferqulî bedela çûn bo xwendingehê, ji kela Gûganê derdikeve û her roj diçe nava şeqara çiyayê bakûr a gundê Gûganê û li dema nîvro de ku deriyê xwendigehê dihate daxistin, ew jî vedigeriya mal û bi vî awayî ew qet neçû xwendingehê. Ceferqulî xwe ji xelkê û hevtemenên xwe dûr dixist û diçû nava çiyayên derdora gund û li wir difikirî heya ku bû 15 salî. Di wî çaxî de bi qewlê xelkê Gûganê her çi hate serê wî, di geliyê naskirî bi **Nalî Çûkan**, de hate serê wî ku ew gelî dikeve navbera gundê Emarat û Behmenganê. Ceferqulî di wî geliyê de ye ku di nûciwaniyê de dibe evîndarê rûyê xweşik û bedew yê Melwarî, Melwarî di Farsî de tê wateya Mirwarîd, ku navê keçên Kurmancan e. Evîna Ceferqulî nexuya bû û kesê nedikarî wê bibîne, tenê çavên Ceferqulî dikarîn Melwarî bibînin. Wê evîna xeyalî, nerastî a Melwarî, Ceferqulî weke Mecnûn li heyrana dîtina Leylayê de koçberî çol û çiya kir û ew di kûreya şewitîner a eşqê de sor sor kir û ji wî arif, helbestvan, muzîkvaneke tewaw û gerîdeyeke têgihîştî û hafiz û şirovekerê Quranê çêkir, helbestên bi cî mayî ji wî, vê yekê ji me re bi tevahî îsbat dike. Ceferqulî piştî vê ku dibe evîndarê Melwarî, bi egera vê ku serdana sererdên cur bi cur û tayfe û tuxmên cur bi cur ên Asiya û Afrîqayê kiribû û nêzîkatî bi wan re

Dom bo R. 11

# REWŞENBÎRÊN ROJANE



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Li rewşenbîrên civakên paşmayî jî dişibe rewşa welatê wan paşmayî. Ev civak, tu car ji hêla rewşenbîrên xwe ve nayên ronîdarkirin û perwerdekirin. berevajî wê, rewşenbîrên wan ji hêla dûgela xwe ve têne birêvebirin û arastekirin.

Li welatên paşmayî, berî ku civak were şardekirin û perwerdekirin, komek/desteyek rewşenbîr ji hêla dewletê ve tên tê gihandin û perwerdekirin û ew rewşenbîr wekî berdevk û parêzerê dewletê têne peywirdarkirin. Rewşenbîrên van welatan, ji berjewendiyên civakê bêtir di berjewendiyên xwe û dewleta ku ew wezîfedarkirine de difkirin. Taybetiya van rewşenbîran a herî balkêş xwe spartina hêz û xêzeke xurt a desthilatariyê ye. Tu car li xwe danaynin ku nêzîkî civakê bibin û di çareseriya pirsgirêkên gel de bifikirin. Wekî tûtiyên dewletê ne. Her gav hêzên mîlîtarîst diparêzin. Berjewendiyên neteweyî ji xwe re dikin hincet û spartek. Hestên civakê yên nîjadperest hişyar dikin û mêjiyê gel bi hizrên şovenîst dijehirînin. Ji bo wan, mirov û civak ewqas ne girîng e; tiştê girîng hebûna dewletê û domdariya pergala cihêwaz, layedar û otokratîk e.

Yeksanî û wekheviya civakî li ba wan ne tiştekî rast û rewa ye. Bi wijdanê xwe naşêwirin; di cuzdana/qewlikê xwe de difikirin. Li ber deriyê hêzên serdest û zoran nobedarî û dergevaniyê dikin. Pênûsa xwe wekî şûrekî xwînî di riya şer û şerûdiyê de bi kar tînin. Li gel ku tu havil û hewldanên wan ên sûdewar nîn in jî, her gav bi serê sermiyan û serwerên xwe sond dixun. Ji bo ku di çavê wan kevin hezar qulobinikan, didin xwe.. Qet qîmetê nadin gel û civakê, belê welatê ku ji hêla gel ve hatiye parastin û avakirin pîroz û pîrozwer dibînin. Dikarin tevê gel û civakê wekî bêbext û xayîn îlan bikin. Ji bo ku bikaribin ku ji xwe re stargeh û aramgeheke rojane ava bikin, li nik hêzên leşkerî cih digirin. Ji ber ku gotin û kirinên wan li hev dernakevin, ji hêla leşkeran ve jî wekî durû û sextekar têne dîtin. Ji bo wê li her derê wekî qijikên beş dixuyin. Ji cil û bergên leşkerî pir hez dikin. Ji ber ku bi hêz û vîna xwe ewle nabin, xwe dispêrin hêza hêzên serdest û desthilatdar.

Ji ber ku hiş û aqilê wan ne yê wan e, fikr û ramana wan jî tu car ne ji kîsê wan e. Wekî kûklayên(pêleystokên) bê vîn û viyan in. Nikarin ji cem xwe de tiştekî biafirînin. Tiştê ku heye jî diherimînin û heba dikin. Ji pirsgirêkên civakê re ker û kor in. Ji dengê aştî û azadiyê direvin û guhê xwe digirin; belê aliyê din, derheqa karê ku ne karê wan be jî devê xwe vedikin. Li cihê ku pest, kotek, zor û stembarî hebe, radibin reqsê; belê li cihê ku behsa dad, maf û mafdariyê tê kirin jî an şiyaniyê dikin an jî şînê dikêşin.


Rewşenbîrên civakên paşmayî yên ku xwe dispêrên hêzên zoran, tu car li nik gel û civakê cih nagirin. Ew, ji leşkeran leşkertir, ji polêsan polêstir, ji dozgeran dozgertir in. Ji bo ku hin kesên xwedî erk, destê xwe di serê wan bidin û bi qerf û tinaz bi wan şa bibin, heft qulobînkan didin xwe û xwe di zinaran werdikin. Dikarin ji bo berjewendiyên xwe yên rojane gel û civakê tune bihesibînin. Newêrek û bizdonek in. Bi tirs û tevdîr tevdigerin. Ji bo wê jî êrîşî kesên bindest û bêhêz dikin. Êrîşkar in, ji bo ku xwe bixin çavê hêz û rayedarên demê şelafiya dikin. Bi tengêla şerûd û şerxwazan dikevin, bi dengekî bilind diqîrin û li defa hawarê didin. Belê li hemberî bêdadî û neheqiyê bêhis û bêdeng dimînin.

Rewşa rewşenbîrên ku li nik civak û hemwelatiyên xwe cih digirin, qet wisa ye. Ew, pêşî xwe perwerde dikin û peyre jî arasteyî civaka xwe dibin û mirov û hemwelatiyên xwe hişyar û ronîdar dikin. Ji bo ku bikaribin xwe ragihînin, radeya ronakbîrî û ronîdariyê cehd û hewldanên bêhempa dikin. Çimkî pîvang û rêbazên ronîdariyê jî dijberî û muxalîfbûn bi xwe ye. Belê muxalîfbûneke çawa û ji bo çi? Muxalîfbûna neqencî, xerabî û neyiniyiyê. Dijberî û muxalîfbûna zordestî û desthilatdariyê. Dijberî û pozberiya çewisandin, tepisandin û fetisandina dengê civakê ye.

Bi kurtayî, rewşenbîrên civakên paşmayî tu car xwe ji bo gel tehl nakin û serê xwe bi kêşe û arîşeyên civakê re naêşînin. Xwe li agirê xweş digirin û pariyê xweş dixun. Bi rastî ew ne rerwşwnbîr in; tenê navê wan bûye rewşenbîr.

## Kaniya Helbestan

# ÎSÎ



**Bêrî Bihar**

Stêra piçûk,
Çiqas xweşik diîsî,
Çend stêr diîsin li dora te?
Tije dibe bi roj bi ronahiya rojê,
Dibiriqî di şevtariyan de,
Diîsî li ser serê erdê.

Tenê li welatê rojê tu
nîşangeha sibehek xweş û ronahî yî.
Li şevên vî welatî tu,
Biîsî, bibiriqî, biçirûsî jî,
Sibe,
Dîsa bi baranên ronahiya
derengmayîn dest pê dike.
Li vî welatî,
Ne tengezarên hev in,
Şevînî,
tarîtî,
stêr,
sibe û ronahî
heya roj jî ne tengezarê tarîtiyê ye
di dema tîrêjdayinê de.
Bi bêhnek fereh li benda meşîna
reşayiya ye.

Stêra piçûk,
Gelo çend stêr diîsin li dora te ?
Heye ku hûn ji çirisandinê aciz
bibin?
Çend stêrên aciz hene li dora te?

Ji bo çi tu ji jorê hatî xwarê?
Gelo tu yê çawa seredariya,
Mijokên çirûsan bikî?
Qey te dil heye destûra mijandina
çirûsên xwe bidî.

Tu yê bêriya hevalên xwe û
leyîstikên we yên îseîsî nekî?
Gelo tu yê ji geremola xwarê aciz
nebî?


Here stêrê, here jor,
Ji nava îsiniyên bingemar here,
Here piçûkê here,
Bi jor ve, bi rojên xweşdîwa ve
û ji xwe,
Li xwarê tu xêr nemaye...

**Çeprast:**

1. Navê giravekê ye di Îranê de – Navê hunermendekî Fars e.
2. Gelek kes bo germkirina malên xwe mifahê jê werdigirin.
3. Pêt . Navê heywaneke çoleme ye – Zeviya ne kêlayî.
4. Xwarineke amade û xweş e – Paşa – Ku di Soranî de.
5. Nesaxiyek e – Di Turkî de dibêjne teyr û tevalan.
6. Hekî ev peyva bê ducarîkirin, tê wateya şîn û taziyê – Navê mehekê ye bi Erebî.
7. Navê rêberê şoreşa Çînê – Heke **K** bihê zêdekirin, navê partiyekê ye – Di Soranî de tê wateya **Gelo**
8. Navê mehekê ye di Îngilîzî de – Navê birayê Fîdel Kastro – Berevajî navê darekê ye.
9. Nûçegihaniyeke Kureya Başûr.
10. Nevê rûbarekê ye di Birîtanyayê de – Tê wateya “Heftî” di Îngilîzî de (Bi rastnivîsa Kurmancî).

**Serjêr:**

1. Navê gulekê ye – Navê bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye.
2. Cure axek e – Hebs bi Turkî.
3. Kar – Ev herêma ku dema xwe Şahê Îranê li hember çiyayê Agirî de ji Turkiyê wergirt – Bilêvkirina tîpa **Y** di Kurmancî de.
4. Reh û rîşeya peyva şûştin+K – Çima bi devoka Hewlêriyan – Ji zeytûnê çê dibe.
5. Bajarek li Bakûra Kurdistanê – Kaniya (çavkaniya) zêra.
6. Navê tirombêlekê ye ku Japan çê dike – Berevajî tê wateya **Lep**.
7. Navê şîrketeke petrolê a Îtaliyayê ye – Heke ev peyva bihê ducarîkirin, tê wateya keniyeke hemdê xwe - Genc.
8. Giriya tund a zarokan ku bibe sebebê bêhn çikbûna wan – Çegwara di kabîneyeke wî welatî de wezîrê “Senayii û Meiden”ê bûye – Di bîrkariyê de dibêjne vê hejmarê (3/14).
9. Navê bajarekî Îranê ye – Edet di Farsî de.
10. Kesê ku bêçine digere – Qebîleke Qewmê Mad bû.




hebû, lewra bi çand û zimanê xelkê wan herêman, yanî Kurd, Fars, Turk û Ereban re nasyar bû û bi van çar zimanên fermî ên herêmê dest bi stirîna helbestan û çêkirina miqam û dengê muzîkê kir. Di rastî de eger Ceferqulî jî weke Nasir Xusro, Ewliya Çelebî û ... sefernameyek ji xwe bi cî hêlaba, bê şik û guman heke ji wan dewlementir û pirnaveroktir nebaya, kêmtir jî nedibû. Ceferqulî yek ji wan kesana ye ku ciyê rûmet û şanaziyê ye bo netewa Kurd û nabixeyekî neteweyî ye ku hetanî niha ew cura ku hewce ye nehatiye naskirin û li ser şûn û warên bi cî mayî ji wî, kareke wisa nehatiye kirin. Ku sebebên bingehîn ên nenaskirî mana wî evne ne:

1. Komnekirina helbestên wî û çapnekirina wan.

2. Ceferqulî Kurd bûye, lewra çi yek ji hikûmetên Pehlewî û Melayan ku dijî netewa Kurd bûne, qet giringiyeke wisa nedane bi nivîskar, helbestvan û ... ên Kurd, belkî her tim xwastine ku şûn û warên netewî ên neteweya Kurd ji nav bibin.

3. Dûrmana Kurdên Xurasanê ji Kurdistanê bi xwe egereke bo bênaviya Ceferqulî.

4. Fêmnekirina zana, helbestvan û nivîskarên Fars ji zanyarî û çanda Ceferqulî bi egera çend cureyiya zimanê wî (Kurdî, Farsî, Turkî û Erebî). Ceferqulî Zengene navên din jî weke Cefer, Ceferquliyê Bêçare, Ceferquliyê Endelîb, Ceferquliyê Muxtar, Ceferquliyê Zengî û Ceferquliyê Kurd hebûne.

Ceferqulî ne tenê qet negihîşte evîna xwe, belkî tevaya helbestên wî, ji bilî yên ku xelkê ew parastin yan jî nivîsandin, ên din bi giştî an ji nav çûn, yan jî di memleketên din de weke helbestên bê nav û nîşan man.

Ceferqulî tenê di nava Kurdan de nayê hebandin, belkî di nava Turk û Farsên Xurasanê de jî tê hebandin û her yek ji van neteweyan, hinek helbest ji Ceferqulî bi zimanê xwe hene û di piraniya rê û resmên xwe de, Ceferqulî weke zanayekî bi bîr tînin û malên xwe bi helbestên wî dixemilînin. Lê Ceferqulî li cem Kurdên Kurmanc ên Xurasanê ciyekî bilind û hêja heye, çimkû Ceferqulî serbarê vê yekê ku helbestvan û ciyê şanaziyê ji bo xelkê wê herêmê bûye, ziman û toreya Kurdên wê herêmê jî parastiye. Ceferqulî helbestvanê destanrêsvan ê Xurasanê aqibet li derdora sala 1315’an ya Heyvî de koça dawiyê kir, her çend ku tu kesî mirina wî nedîtiye, lê li gorî lêkolînên nivîskar û zanayê Kurd ê Bakûra Xurasanê, Kelîmulah Tewehudî, renge Ceferqulî di derdora sala 1315’an de koça dawiyê kiribe û wî çaxî 95 sal temenê wî bûye. Bi mirina Ceferqulî, Kurdên Xurasanê yek ji kesayetiyên mezin û bênimûne yê xwe ji dest dan. Lê îro rojê Kurdên akinciyê Xurasanê weke mirovên têniyê avê li du helbestên Ceferqulî ne û her salê bi rêvebirina rê û resmekê di Gûganê de wî helbestvan û zanayê mezin ê Kurd bi bîr tînin. Di rê û resmekê de ku li sala 1384’an a Rojî (2005), di Gûganê de bona rêz û hurmetgirtina ji yad û bîranîna Ceferqulî bi cehd û tekoşîna mamosta û nivîskarê Kurd Kelîmulayê Tewehudî pêk hatibû, nêzîk 6000 xwendekarên Kurd ên bakûra Xurasanê tê de beşdarî kirin ku beşdariya wan bi xwe nîşaneya vê yekê ye ku Ceferqulî ji aliyê xelkê wê herêmê ve pir tê hezkirin. Ceferqulî helbestvanekî netewî ê neteweya Kurd e. Îro erkê li ser milên me ye ku ji bilî Kurdên neteweparêz ên Xurasanê, em jî tewayî cehd û tekoşîna xwe bi kar bînin, bona nasandina vî helbestvanê netewî bi Kurdên seranserî Kurdistanê da ku bi vî awayî serbarê xizmeta bi tore û huner û dîroka Kurdistanê, me rêz û hurmet ji riha vî navdarê Kurd girtibe.

**Çend parçe ji helbestên Ceferqulî Xan**

1:

Wesfê yarê biwêjim, ez li dur û zemanê
Tarîfê wê ez bêkem, mîna gulê cenanê
Newe qelem mumkin, tersîmê gulcîhanê
Newe zimîn tê gotin, wesfê şîrîn zimanê
**Bê hemta, bê manendê, li xelkê Kurdistanê**

2:

Yar were ser xakê min, mezarê min bilivîn
Wê bejn û balê reina we nekîran binimîn
Je serê wan biwe hûş, je wan bistîn eql û dîn
Vê navê emalê min ji wan hilgir, bidirîn
Hînga dade destê min, je bin xakê bikişîn
Ta biwînim qudretê xudawend le rûy zemîn
Je husn û cemalê te, xeber biwêne asimîn
Le ser serê min bise, mest û mestane, dilwer

**Çavkanî:**

**1) Dîwana îrfanî ya Ceferqulî, N: Kelîmulahê Tewehudî**

**2)Kovara Kirmanc**

**3) Hereketa dîrokî ya Kurdan bo Xurasanê, bergên 2,3,5**

## Bersiva Xaçepirsa Hejmara 47’an

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | E | X | ■ | B | A | Z | ■ | B | Î |
| 2 | O | Z (3) | O | N | ■ | R | Î | S | ■ | T |
| 3 | ■ | A | N | Î | S | ■ | N | Î | R | ■ |
| 4 | K | ■ | O | M | E (2) | M | ■ | S | U | T |
| 5 | Û | N | ■ | A | R | A | Z | ■ | G | O |
| 6 | R | Ê | T | ■ | Ê | N | A | K (1) | ■ | V |
| 7 | ■ | Y | Ê | M | ■ | A | Z | E | R | ■ |
| 8 | P | ■ | M | O | L | ■ | A | L | Û | Ş |
| 9 | A | Ş | ■ | X | O | X | ■ | Î | S | A |
| 10 | T | Û | R | ■ | Y | O | L | ■ | Î (4) | M |

Peyva veşartî: K (1) E (2) Z (3) Î (4)

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci. php

Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE
E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com



# Orhan Pamuk Xelata Nobel Ya Wêjeyê Wergirt



Roja pêmcşem, 12.10.2006'an Akademiya Swêdê li bajarê Stokholmê, Orhan Pamuk, romannivîsê Turk û dostê Kurdan wek wergirê Xelatê Nobel ya Wêjeyê a sala 2006'an îlan kir.

Di daxuyaniyekê de ku Akademiya Swêdê bi vê hincetê weşand, nivîskarê Turk Orhan Pamuk, seba **lêgerîn di rihê meladiramtîk di bajarê xwe(Stenbolê) de** û her wiha **afirandina sembolên nû ji bo pevçûn û ketina nav hev a çandan** hêja û kêratiyê wî xelatî zaniye.

Orhan Pamuk, 54 salî ye û yekemîn nivîskar di cîhana Îslamê de bû ku biryara Fetwaya Xomeynî, Serokê olî yê Komara Îslamî ya Îranê ji bo kuştina Selman Ruşdî, şermezar kir. Ew miroveke demokrat e û dostê nêzîk yê Kurda ne. Orhan Pamuk bi nivîsandina gotaran û 10 berhemên xwe ên pirtûkan de fikr û rayên xwe yên der barê mafên mirovan, azadiya ramanê, demokrasî û hwd... pêşkêş kirine. Ji ber gotinên wî ên der barê qirkirina 1 milyon Ermenî û kuştina 30 hezar Kurdan (ji aliyê dewleta Turkiyê) hat darizandin û bi sê salan cezayê girtîxaneyê mehkûm bû. Dana Xelata Nobel ya Wêjeyê ya 2006'an nîqaşek xurt di Turkiyê de pêk anî û ne bi dilê aliyên tundrew û şovenîst ên Turk bû. wan bi tundî di medyayên xwe de êrîş kirin ser Orhan Pamuk.

Piraniya berhemên Orhan Pamuk, Roman in û bi gelek zimanên cîhanî hatine wergerandin. Romana wî ya "Benim Adim Kirmizi" ku sal 1998'an hate weşandin, ji aliyê nivîskarê Kurd, Mistefa Aydoxan, bi navê "Navê Min Sor e" bi Kurdî hate wergerandin.

Orhan Pamuk, dê 1 milyon û 360 hezar pareyê "Euro" wekî xelat bigire.

**Xelatên din yên Nobelê ya 2006'an**

Xelata Nobel ya Aştiyê ya sala 2006'an dan Mihemed Yûnis, yê Bangladeşî. Ew ji ber alîkariyên pere bi çend milyon mirovên feqîr û xizanan li Bangladişê ku yek ji welatên xizan ên cîhanê ye, hêjayî vê xelata navneteweyî hate nasîn.

Ew Profesor û Doktor di warê aborî û pêşketinê de ye. Bi dana pere alîkariya destkurt û xizanan di welatê xwe de dike. Yûnis avakerê bangekê binavê "Gramên Bank"e ku ji rêya vê bankê ve alîkariyên pere ji xizan û belengazên welatê xwe dike.

Xelata Nobel ya Kîmyayê a 2006'an bi Racêr Karenbêrg, mamostaya Zanîngeha Stanford li Amerîka hate dayîn. Bavê wî jî 50 salan berî niha Xelata Nobel ya Bijîşkiyê wergirtibû.

Xelata Nobel ya Fîzyayê ya sala 2006'an bi awayekî hevpar ji 3 kesên jêr re hate pêşkêşkirin: Aleksî Ebrîskof û Wîlatî Gînzbêrg yên Rûsiyayê û Antonî Lêgt ku li Îngilistanê ji dayîk bûye û niştecihê Amerîkayê ye.

Xelata Nobel ya Bijîşkî a sala 2006'an ji du zanayên Amerîkî bi navên "Andrew Fire" û "Craig Mello" bi awayeke hevbeş hate dayîn. Xebata wan ya di warê Bijîşkiyê dikare ji bo dermankirina nexweşiyên Korbûn, Penceşêr û Îdz(HIV)yê bikar bihê.

Her wiha aborînasê Amerîkî, "Edmund Phelps" Xelata Nobel ya Aboriyê ya sala 20006'an stand.

**Jêder: Rojnameya Avesta**

# Fîlma Behman Qubadî Li Îranê Hate Qedexekirin

Fîlma derhênerê Kurd, **Behman Qubadî**, ya bi navê "**Nîvê Heyvê**" ku li festîvala 54'an ya "San Sebastian"ê de xelata baştirîn fîlmê wergirt, bi sûçê cudahîxwaziyê ji aliyê Wezareta Çandê ve li Îranê hate qedexekirin.

Derheq fîlmê de, Qubadî, got: "Xwe li ser fîlmê sansur hebû!, lê belê ez heya niha tênegihîştime ka çima li Îranê hate qedexekirin!"

Behman Qubadî, di hevpeyvînekê de tevî rojnameyeke Kanadyî, got: "Ez bi vê fîlmê têm tewanbarkirin ku ez doza kurdbûn û cudahîxwaziyê dikim, lê ne wiha ye... ji ber ku fîlm neyê sansurkirin min, bi xwe hinek perçe jê derxistin, lê dîsa hate qedexekirin..."

Qubadî, di hevpeyvîna xwe de diyar dike, ji bo standina destûra pêşkêşkirina fîlmê li Îranê, wî serî li Wezareta



Çandê daye, lê belê bersiveke wiha jê re hatiye: "Vê Fîlmê ji bîra xwe bibe, ji xwe re li fîlmeke din bigere...".

**Çavkanî: "Avestakurd"**

# Yekemîn Zandora Perwerdehiyê Ya Rêveberên QENDÎL TV

Qendîl TV

Li gorî daxuyaniya YCDK Îranê – Swêd, Komîsyona Ragihandin û Perwerdehî û Fêrkirina vê saziyê, roja 07.10.2006'an yekemîn zandora perwerdehiyê ji bo rêveberên Qendîl TV serkevtiyane rêve bir.


Qendîl TV ji aliyê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ya Kurdistana Îranê – Swêd hatiye avakirin. Programên vê televîzyonê mehê carekê li herêmên Vesmaland û Sodmanlanî yên Swêdê, li ser kanalên herêmî û hevdem du caran di mehê de li ser malpera înternetî ya "Lawan" belav dibe.

Hêjayî gotinê ye ku yekeîmn zandora perwerdekirina kadroyên rêveber ên Qendîl TV li ser mijarên jêr bû:

- Çawaniya hilbijartin û çêkirina nûçeyan
- Çawaniya amadekirina raporan
- Çawaniya pêkanîna hevpeyvînan
- Çawaniya nûçegihaniyê
- Wêne kişandin
- Karê derhêneriyê
- Çawaniya karê rojnamevaniyê û ...

Hêjayî gotinê ye ku di navbera vegotina waneyan bi awayê teorîk de, hevdem ji bo bêtir elimandina Kadroyên Qendîl TV karê piratîkî jî birêve çû.

# Li Bajarê Serdeştê Dest Bi Ser Dehan Dezgehên Setelaytan Hate Girtin



Êvariya roja sêşem, 18.04.1385(10.10.2006)'an, heya êvariya roja çarşem, 11.10.2006'an, hêzên Ewlekariyê û Întizamî yên rejîmê li bajarê Serdeştê de bi armanca komkirina dezgehên setelaytan, dest bi lêgerîna malên xelkê kirin û li gorî nûçeyan di vê heyamê de dest bi ser dehan dezgehên setelaytê xelkê girtin.